

# Guida pratica per i richiedenti protezione internazionale



## SPRAR

Sistema di Protezione  
per Richiedenti Asilo e Rifugiati



Dipartimento per le libertà civili  
e l'immigrazione

Commissione Nazionale  
per il Diritto d'Asilo

## **Fêrist**

Tu li vê derî – Xerîteya Îtalyê

Ê li parastina navnetewî digere kî ye?

Tu keti nav ewropaye yekbuyi

Xerîteya Ewropayê Yekbûyî

Gihîştina prosedûra daxweza parastina navnetewî

Gihanekên daxweza parastina navnetewî

Berpêşkirina daxweza parastina navnetewî (Gihanek I)

Daniştin (Gihanek II)

Tu di navendeyeke hikûmatê de bûyî mêvan

Mafên te yê li navenda mafê penaberî geran

Wek parastingereke navnetewî mafên te

Biryarên ku komîsyona herêmî dikare bistîne (Gihanek III):

Ku statûya te ya penaberî were nas kirin

Ku te statûya parastina kêlî standi be

Ku tu yekê ku xwedîyê destûrekî mayinê ji bo sedemên mirovatî bî

Serlêdanîya dadgeha temyîzê (Gihanek IV)


Dawî hatin û betal bûna statûya parastina navnetewî

Bi dilê xwe vegerîna welatê xwe ya xwemalî

Ferhengok

Pêwendîyên bikêr

TU LÎ VÊ DERÎ - XERÎTEYA ÎTALYÊ



## Ê LI PARASTINA NAVNETEWÎ DIGERE KÎ YE?

Ê li parastina navnetewî digere ew e ku serlêdanî bi parastina navnetewî kiribe û hêvîya qebûl bûna biryara statûya penaberî an bi parastineke bi haweyek din be. Li Îtalyê, mafên hemû koçberan he ye ku serlêdanî bi parastina navnetewî bikin.

### PENABER EW E KU

Kesî an kesê ku li welatê xwe tirsekî wî/wê zordestî di cîh de he ye, an li welatê xwe ya her tim jîya be de kêmasîya xwe ya hevvelatî he ye, ji ber sedemên ku:

- **nijad** (mînakî, ji ber rengê çermê xwe an ji ber ku endamê grûbek etnîk bi taybetî, qewmek/komek an hindikahî ye);
- **ol** (mînakî, ji ber dîyar kirin an ne dîyar kirina olekî wekat, an ji ber endam bûna grûbek olî ya wekat);
- **neteweyî** (mînakî, ji ber sedema bûyina ji hindikahîyek etnîk an zimanî);
- **endam bûna grûbek civakî ya wekat** (grûbek mirovan ku karakterîstîkên hevpar he ne an wekî di nav komel de bi van mînaka têne zanîn, mînakî, cinsî an cinsîyetî, berhêla cinsî, malbatî, çandî, perwerdeyî, an karbendî);
- **rayên polîtîk** (mînakî, ji ber sedema rayên polîtîk, tevgerên polîtîk, rayên polîtîk ê guman kirî, an liber rabûnên wicdanî);

Û nexwaze an bimefer nîn be ku ji hikûmata welatê xwe ya xwemalî an ji cîhê her tim jîya be parastin bistîne.

Zordestî tê fam kirin, mînakî, gefên li jîyan, îşkence, ji serbestîya kesani bi neheqî bêpar hiştin, an îhlal kirinên mafên mirovan bi giranî.

Ji bo bi cîh bûna qebûl bûna statûya penaberî ne divête ku ji xwe bûbe qurbana zordariya birastî.

Dibe ku keseke ji ber bi paşve şandinê sedemên xwe ye di cîh de he ne ku ji rîska giran ya zordestiyê tirsra dûçar bûn he be statûya penaberîya wê bê nas kirin.

Rave kirina biwêja “penaber” di deqa 1. ya Konvensiyona Cenevre ya 1951 li ser statûya penaberî he ye, li ser ku penaber keseke ku”*ji sedema tirsra bi cîh ji dîtina zordestî ji ber nijad, ol, neteweyî, rayên polîtîk, an endam bûna grûbekî civakî ya wekat, li derveyî welatê*

*xwe ya neteweyî ye û bimefer nîn e an naxwaze, ji ber vê tirsê, ji parastina hikûmata vê welatê kelk bigire; an keseke ku ne xwedîyê neteweyeke û ji ber dawîyên bûyerên wiha li derveyê welatê ku berê jîyaye ye, bimefer nîn e an naxwaze, ji ber vê tirsê, vegere wê derê.”*

Bi gelemperî, pirsgirêkên aborîyê, tevî ku rast be û di hinek rewşan de gelekî girîng be jî, ji nas kirina statûya penaberî re dozînan pêk nayî ne.

**PARASTINA KÊLÎ** parastineke ku ji bo yekî ne hevvelatê Ewropayê Yekbûyî be, an keseke bêwelat ku hoyên xwe ya wek penaber bê qebûl kirin tune ne, lê di şêwra veg-erîna wî an wê ya Welatê xwe ya xwemalî, an cîhê ku elimîne bijîn, sedemên di cîh de hebîn, di kiryar de rîska xisara giran he be, û nikare an naxwaze, ji ber vê rîskê, ji parastina welatê qalkirî îstîfade bike têye dayîn e.

Navenda polis ya **PARASTINA MIROVTÎ** wexta ku Komîsyona Herêmî, piroleyên parastina navnetewî qebûl neke, ji bo daxweza mafê penaberî ya kes “sedemên giran ê xwezayîya mirovtî” nîşan bide, dikare destûreke mayîn ji sedemên mirovtî derxe.

### Nepenî

Agahdarîya ku tuyê ji bo kesên di nav prosedûra analîza daxweza parastina navnetewî de be amade bikî nabe ku ji rayedarên Welatê xwemalîya xwe re bê dîyar kirin an bê ragihandin.

## TU KETÎ NAV EWROPAYÊ YEKBÛYÎ

Tu li Îtalyêyê yî; ev tê maneya ku tu ketî nav Welatekî Endamê Ewropayê Yekbûyî.

Li gorî qanûna Ewropa (**Rêznameya Dablin II**) tu nikari bi sere xwe biryar bidî ku tuyê ji kîjan Welatî parastinê bixwazî, tevî ku daxweznameya te ji alî rayedaran ve tê sehetî kirin jî, mînakî:

- Welatê yekem ku tu bê rayedarî ketîyê;
- Welatê ku **destûreke mayînê an vîzeyaya ketinê** da te;
- Welatê ku **xizma te bi serûber** lê dimîne, ku tu li Îtalyêyê ezebeke tenê bî.
- Welatê ku **xizma** te ya ku wekî penaber lê dimîne an mafê penaberî xwestî ye.

**Xizm** wiha tê fam kirin:

- mêrê te an jina te;
- kesê ku xizmantîya te ya pêdandî pê he ye, ku welatê mazûvan bi zewacê re wekhev bibîne;
- zarokên te yên ezeb, bi hoya ku tu ji alî aborî de balpiştî didî wan û ne zewicandî ne;
- ku tu ezeb bî û ne zewicandî bî bavê te, dîya te an parêzgera te.

Awayên ku li jorê hatin nîşan dan tenê herî yên silxetî ne; ji bo têrkerî pîvanên din he ne. Ji bo şik birin û wek agahîya pêvek, ji kerema xwe re bi personela navend re bikevin têk-îlfyê.

Destnîşankirina têrkerî yê analîzên ji bo daxwezîyên parastina navnetewî yê Îtalyêyê dê ji alî polîsê navendê ve neyê kirin. Polîs dê hemû belgeyan bişîne liqa birêk ya Wezîriya Karên Hundir li Roma (nave wê “Liqa Dablin” e), cîhê ku dê bi raya daneyên di dest de biryar bide. Tevî vê, ji bo armancên biryareke bi rêkûpêk, pêk anîna hemû agahîya pêwist girîng e. Di bîr de be ku mafê te bi zanîna hemû agahîyên ku ji “Liqa Dablin” re hatine şandin he ye û, ku daneyên nerast hebin tu wan rast bikî.

Di dema prosedûra pêk anîn de, ger ku welatê rayedar ji bo sehetîya daxweza penaberî Îtalye be jî, statûya te di herêmîya Îtalyêyê jî wê çaxê penaber e.

Di rewşa ku biryarek he be ku Welat pêwist be daxweza te ya parastina navnetewî binirxîne, piştî ku biryara Liqa Dablin bigîje te di nav 60 rojan de tu dikarî temyîz bikî. Qanûn pêk tîne ku tu dikarî alîkarîya parêzereke bistînî. Ku tu nikaribî heqê parêzer bidî, tu dikarî daxweznameyeke ji bo alîkarîya qanûnî bêdawe bidî (ji pêşawazî kirina Hikûmatê).

## XERÎTEYA EWROPAYÊ YEBBÛYÎ



© Koma Ewropa, 1995-2007

Welatên endamê Ewropayê Yebbûyî vana ne: Awistiryê, Belçîqe, Bulgarîstan, Qibris, Denîmark, Estonye, Fînlandîye, Franse, Almanye, Yûnanîstan, Îrlande, Îtalye, Latvîye, Lîtvanye, Luksemburg, Malta, Hollande, Polonye, Portegîz, Keyaniya Yebbûyî, Komara Çek, Romanye, Slovakiye, Slovenye, Îspanye, Swêd, Macarîstan.

## GIHÎŞTINA PROSEDÛRA DAXWEZA PARASTINA NAVNETEWÎ

Daxweza parastina navnetewî şexsî ye û divê bê berpêşkirina:

- ji Polîsa Sinor re, di wexta têtetina Îtalye de;
- ji Beşa Polîs- Liqa Polîs ya Penaberî re, ku tu ji xwe li Îtalyêê bî.

Heta ku Komîsyona Herêmî biryar li ser daxweza te ya parastina navnetewî bide raya te ya mayîna li herêma Netewî he ye.

**BI BÎR XE:** HETA KU SEHETÎYA PROSEDÛRA DAXWEZA PARASTINA NAVNETEWÎ DAWÎ BIDE DÊ SER KARMEND CÎHEKÎ KU TUYÊ BIKARIBÎ BIMÎNÎ NÎŞAN DE.

Daxweza te ya parastina navnetewî tenê ji bo ku berpêşkirin di wextê de ne hatîbe kirin nikare bê red kirin an bê li derve hiştin. Ji bo berpêşkirina daxwezê dawîroj tune ne.

Derfeta pêwendî bi Unhcr (Neteweyên Yekgirtû Komîserîya Bilind ji bo Penaberan) û sazûmanên sereke ji bo parêza van daxwezên parastina navnetewî re danîn di her gi-haneka prosedûrê de garantî kirî ye.

Wexta ku tu bêyî dawet kirin, divê tu li ber komîsyona Herêmî xwe şexsen nîşan bidî. Pêwist e tu pasaport û hemû belgeyên pêwendî bi daxwez re yê din radest bikî.

**BI BÎR XE** KU HER TIM WEXTA KU TU CÎHÊ RUNIŞTGEHA XWE BIGUHÊRÎ AGAHÎ BIDÎ POLÎS; AN, HER TIŞTÊN KU GERE BIGÎJE TE EWÊ BÊ QEBÛL KIRIN KU TE DI RUNIŞGEHA KU TE CARA DAWÎN RAPOR KIRIYE DE STAND, GER KU TU BIDEŞT NEKÎ JÎ.

Komîsyona Herêmî daniştina te pêk tîne; ragihîn dê bi saya Beşa Polîs bê ji te re şandin.

Hevdîtinên şexsî bimefer e ku wexta tu ji sedemên tendurustî nikaribî werî bê ne paşde avêtin. Sedemên tendurustî yê giran ku destûrê nedin tu werî hevdtin divê ji alî bijîjkê ve bê tesdîq kirin.



## BI BÎR XE

- DI HER HALÎ DE, KU TU NEYÊ HEVDÎTINÊ, Û KU TE DAXWEZNAME JI BO PAŞDE AVÊTINA HEVDÎTINÊ NEDABE KOMÎSYONÊ TENÊ DÊ LI SER BELGEYÊN HE NE KU TU BIPERGAL DER HEQ AGAHDAR BÛBÎ BIRYAR BIDE.
- KU, HER WIHA, TU DER HEQÊ DANIŞTINA KOMÎSYONÊ DE AGAHDAR NEBÛBÎ, Û KOMÎSYONÊ LI SER DAXWEZA TE YA PARASTINA NAVNETEWÎ DE BIRYAR NEDA BE, TU DIKARÎ PIŞTÎ KU HOYÊN KU DESTÛRÊ NEDIDAN TU WERÎ HEVDÎTINÊ BIQEDIN TENÊ JI BO CAREKÎ Û DI NAV 10 ROJAN DE JÎVANEKE NU BISTÎNÎ.

Ev di binyada avahîyê gihanekên parastina navnetewî yê paşîyê ye.

## GIHANEKÊN DAXWEZA PARASTINA NAVNETEWÎ

### BERPÊŞKIRINA DAXWEZA PARASTINA NAVNETEWÎ (GIHANEK I)

Daxweza parastina navnetewî şexsî ye û divê bê berpêşkirina:

ji Polîsa Sinor re, di wexta têketina Îtalye de;

ji Beşa Polîs- Liqa Polîs ya Penaberî re, ku tu ji xwe li Îtalyeyê bî.

**BI BÎR XE:** ku tu dê û bav bî, serlêdana te zarokên te yê ezeb yê nezewicî yê ku niha di herêma Îtalyeyê de ne jî digire naveroka xwe.

Ku tu bê vîzeyeke şexsî ketibî Îtalyeyê, û bê destûr bî, qanûna Îtalyeyê **prosedûreke nasname** amade dike, ku ji alî polîs ve tête çêkirin; ev tê maneya ku berîya berpêşkirina serlêdana penaberî hewceye tu bêyî nas kirin.

Li ser vî yekî, tuyê ji bo tarîxa hevdîtî li navenda polîs bêyî agahdar kirin. Di dema vî hevdîtî de, dê karmendeke polîs û – ku hewce be – wergereke ku zimanê te ya yekemîn an zimanêke din ku destûrê dide te ku tu xwe bînî ziman dipêyîve he be.

Polîs dê wêneya te bikşîne û rêçilîfîyên te bistîne (“*Fotosegnalamento*” = prosedûrek ji bo nasnameya te birastîne)

Paşyê ji bo serlêdana te bikeve resmîyetê tuyê hevdîtîneke bikî, ku dê “Forma standard ji bo qebûl kirina statûya penaberî, li gorî Konvensiyona Cenevre” (Forma standard C/3) wê çaxê bê tije kirin.

Pirs dê der heqê daneyên teyê şexsî (nav, paşnav, tarîxa zayînê, cîhê zayînê, neteweyî) û xizman (nav û paşnava dê û bavên te, nav û paşnava mêrê/jina te, nav û paşnava zarokên te, cîhê ku xizmên te dijîn); wekî din dê ji te bê pirsîn:

- raber kirina rêgeha te ji welatê te ya xwemalî heta Îtalyê (wekî, kengê derketî rê, rêbarî çiqas dewam kir, navên çûnbarên ku hatine bikar anîn);
- vegotîna sedemên ji welatê xwe veqetîn bi kurtî;
- nivisandina van sedeman bi kurtî: tu dikarî bi zimanê xwe ya yekemîn an bi zimanêke din ku destûrê bide tu xwe bînî ziman binivisîn.

**BI BÎR XE:** xebatkaran an polîs agahdar bike ku di xwendinê an di nivisandinê de astengîyên te he ne

**Polîs dê orîjînal forma standard C/3 bistîne û jêgirtîyêke dê bidin te.**

Hemû agahdarîyê ku di hevdiîn de ji polîs re têye dayîn nepenî ye:

- nikare ji rayedarên welatê te yê xwemalî re bê dayîn;
- nikare ji kesên di navendê de an derveyî navendê re bê dayîn.

**Tu dikarî rupelekî ku çîroka te ya şexsî nivisandîye bi forma standard C/3 ve pêvekî. Ne hewceye ku tu bi Îtalyanî binivisînî; tu dikarî rasterast bi zimanê xwe ya yekemîn binivisînî.**

Polîs dê ji te bipirse ku belgeyên te he ne an tune ne (wekî nasname, pasaport, LAP (destûra têtetina bitaybetî), qertê endamîya partî, destûrnameyan). Ku belgeyên te hebin, pasaport jî tê de, wan bide destê polîs û ewê jibergirtîyan ji wan derxin.

Polîs dê orjîmalan bigirin û jibergirtîyên morkirî (“bi qeyda paşve dayîn”) bidin te.

### **Daxweza hewandin**

Ku debarîya te tune be û ku ne li navendeke hikûmatê ya hewandin bî, tu dikarî ji Beşa Polîs daxwezî bikî ku bi Parêzgarî re ji bo di navendeyeke hewandinê ku ji alî taybetmendîyên Herêmî ku di nav Sîstema Parastin ji bo penaberî geran û penaberan (Sprar) de be bimînî bikevin têkilîyê.

### **BI BÎR XE**

- Wexta serîlêdan, navenda polîs dê te di heqê prosedûra rêçûnê de, mafên te û pey-wirên dema prosedûrê de, û wext û rêyên regezên bikêr ku tuyê bi serîlêdana xwe balpiştî bikî de agahdar bike;
- Wexta ku careke nevanda polîs serîlêdana parastina navnetewî distîne, raporek gelale li ser vegotina te amade dike û belgeyan pê ve dike. Wexta ku tu vê raporê erê dikî û îmza dikî, jibergirtîyêke tevî jibergirtîyên belgeyên pê ve dê bidin te;
- Komîsyona herêmî bifikire ku sedemên statûya penaberî ji bo qebûl kirin têrker in dibe ku biryar bide ku hevdiînî bi te re ne ke; wekî din, ku tu ne di rewşa xuyabûn de bî komîsyon dibe ku bi te re hevdiînî ne ke an hevdiînîyê paşde bavêje;
- Ku tu bê serîledanî ji bo paşde avêtinê neyê hevdiînîyê, biryara komîsyonê dê bi binyada bikar anîna belgeyan bibe;
- Agahîyên ku te di nav prosedûra serîlêdana parastina navnetewî ji bo sehetî kirin dabe rayedaran an xebatkaran nabe ku ji rayedarên welatê te yê xwemalî re bê ne dîyar kirin an bêne dayîn;
- Girîng e ku tu sedemên xwe yê terikandina welatê xwe bi temamî dîyar bikî û binivisînî;

- Ku astengîyên te yê rê rave kirin an nivisandin he bin, ku neyê bîra te, ku tu xwe reht seh bikî an wexta bibîr anîn û dîyar kirin di tengezarî de bî, an ji bo dîyar kirin hewceyê zêdetir wext he be, ji kerema xwe re di wexta hevdtînê de vîya bide zanîn;
- Ku wexta te tune be tu hemû sedemên ku çima tu ji welatê xwe revîyayî dîyar bikî û/an binivisînî, ji kerema xwe re vîya wek tişteki herî girîng bide zanîn û dîyar bike ku temamkirî nîn in;
- Ku tu nikaribî hemû sedemên ku çima tu ji welatê xwe revîyabî dîyar bikî, piştî hevdtîna bi polîs re danezanek pêvek binivisîne û wexta temam bû wê bizivirîne;
- Ku tu li ser di civîna bi polîs an bi werger re çî hat gotin de hewceyê rave kirina bî an gumanên te he bin, ku tu ji bo çêtir nivisandin an bibîr anîn hewceyê alîkarî bî, vîya ji niwênera qanûnî ya navendê re bibêje;
- Her tim bi bîr xe ku te jibergirtîyên belgeyên orîjînal ku te dabe polîs standî ye.

Hemû nûçegihanên li ser serflêdana mafê penaberî (mînakî, daniştineke bi polîs an bi Komîsyonê re, daxwezekê ji bo belgeyan, guhaztina welateke din, biryarên Komîsyonê) di zimanê te yê yekemîn de dê bicîh bibe, û ku ev ne bimefer be, li gorî tercîha tuyê bibêjî dê bi Îngîlîzî, Fransîzî, Spanyolî, an bi Erebi be.

## DANIŞTIN (GIHANEK II)

Biryara li ser serîlêdana parastina navnetewî peywireke ku ji alî grûbek bi nave **komîsyona herêmi ji bo qebûl kirina parastina navnetewî** têye bicîh anîn, ku ji 4 endaman hatîye pêk hatin:

- 2 endaman ji Wezîriya Karên Hundir
- 1 niwêner ji şaredariyê (an ji parêzgarîyê an ji herêmi)
- 1 niwêner ji UNHCR

Qanûn dibêje ku dawetnameya ku dê ji Komîsyona daniştin (an hevdîtini) bê divê ji alî polis de bi formeke nivisandî bê ragihandin.

Di daniştinê de dê wergereke ku zimanê te dipêyive û çî bê gotin wergerîne he be.

Tu dikarî daniştinê ji sedemên tendurustî, ku divê bi destûrname be, an ji ber sedemên giran yê din bidî paşde avêtin.

Tu dikarî serîlêdanî bikî ku hevdîtinekê tenê bi yek endameke Komîsyonê û ji cinsiyeta te be.

Di van rewşan de girîng e ku tu xebatkarên navendê agahdar bikî.

Daniştin dê di nav **30 rojên** di dawîya berpêşkirina belgeyên serlêdanî bê çêkirin û komîsyonê dê biryarê di sê rojên dawî de bide.

### BI BÎR XE:

- Wexta ku li ser tiştên eşkereyî bê qebûl kirin û rewşa te wek ji êriş re vekirî bê hesabandin serîlêdanîya te dê bi **sehetîya pêşani** bê berpêşkirin.
- Ku tu penabereke qebûl kirî bî an tu ji xwe hatibî red kirin û bê rastîyên an bûyerên nu te careke din serîlêdanî kiri be Komîsyon serîlêdanîya te wek **nebirêke dide zanîn** û sehetî dewam nake.

Komîsyon dikare biryar bide ku daniştina şexsî bide sekinandin an paşde bavêje wexta ku:

- Ji bo biryar danê zêdetir wext an belgeyên zêdetir hewce be;
- Ne bimefer be ku tu di daniştina şexsî de amade bî;
- Pirsgirêkên ragihandinê bi werger re he bin.

Komîsyon dê ji te di heqê vana de bipirse:

- Daneyên te yê şexsî û yê xizmên te,
- Rêbarîya te
- Sedemên ku te çima welatê xwe ya xwemalî terikandî ye.
- Sedemên ku tu naxwazî an nikarî vegeerî welatê xwe ya xwemalî.

### BI BÎR XE KU:

- Ku tu ezeb bî, danîştina şexsî li ber Komîsyonê dê bi amade bûna yekî ji dê û bavê te an li ber parêzgera te bê kirin;
- Li ber Komîsyonê mafê te he ye ku tu xwe bi zimanê xwe ya yekemîn îfade bikî;
- Ku pirsgirêkên te yên ragihandinê bi werger re he be, ji kerema xwe re Komîsyonê agahdar bike;
- Agahîyên di wexta danîştina şexsî de hatibin dayîn gelekî nepenî ne;
- Qanûn pêk tine ku tuyê dê di wexta danîştinê de ji alî parêzer ve bêyî alî kirin. Ji bo pêwendîya bi parêzer re û civîneke berî danîştinê, bi xebatkarê qanûnî ya navêndê pêwendî bike;
- Tu dikarî belgeyan an vegotinên xwe berî danîştinê bişîmî Komîsyonê;
- Girîng e ku tu çîroka xwe bi temamî û bi kitekit bi rêk û pêk bibêjî;
- Ku astengîyên te yên rave kirin he bin, ku baş nayê bîra te an astengîyên te he ne, an wexta ku tê bîra te an rave dikî xwe nebaş seh dikî, di wexta danîştinê de bibêje;
- Ku pirsgirêkên te yên fîzîkî an psîkolojîk he bin bi hawe ye ku tu Komîsyonê agahdar bikî, û hewce be, tu dikarî ji alî personelên navêndê bêyî alîkar kirin;
- Tiştên di wexta danîştinê de dibêjî li ser kaxizekê tê nivisandin (qeyd kirin), ku tuyê îmza bikî, û ku dê di dawîya danîştinê de bê dayîn. **Berî ku tuyê îmza bikî wergerîna tiştên li ser kaxiz nivisandî be bixwaze**, ji bo emîn bûna ku tiştên te gotîye bi rastî hatibin girêdan. Ku tu îmza kirina qeyda red bikî, sedemên te ji bo vê dê bê dîyarî kirin. Red kirin dê ji bo qebûl kirina serîlêdana te ya parastina navnetewî ji Komîsyonê re ne be astengîyeke.

### Bi taybetî, ku tu ezebeke li herêma Îtalyêyê bî:

- Komîsyon tenê bi amade bûna yekî ji dê û bav an parêzgereke guhdarî dike;
- Ku Komîsyon ji xwe li ser belgeyên te dabe û bi vegotinên ku te dabe polîs **biryareke erênî** encam kiri be **dikare biryar bide ku gazî te û danîştinê ne ke**.

Gihaneka Biderfet

## TU DI NAVENDEYEKE HIKÛMATÊ DE BÛYÎ MÊVAN

Tuyê di navendeyek hikûmatê ya penaberî ji bo kesên parastina navnetewî digerin de bêtî hewandin:

- 1 - **Ku te piştî li sînora ji ber gurêzîn an hewl dana gurêzîn ji sehetîya sînora hatibî sekinandin, an hema dawî de serîlêdanî kiri be;**
- 2 - **Ku te piştî ji ber hoyên bêray runiştin hatibî sekinandin serîlêdanî kiri be;**

**Li gorî Qanûna Îtalyêyê, bêray ji navenda mazûvanê çûndin ne beramberê dev ji serîlêdanîya mafê penaberî berdane, lê komîsyona herêmî li ser agahîyên di dest de biryara serîlêdanîya parastina navnetewî dide.**

Wexta ku dilê te he ye ku tu herî, ji bo her tiştên ku niyet dikî bikî, û ji bo agahîya zêdetir her tim ji karmenda qanûnî ya navendê bipirse.

Di rewşên 1 û 2yan de Qanûn destûrê dide ku, piştî gava te serîlêdanî ji bo mafê penaberîyê kiri be tuyê demeke ji **35 rojan** ne zêdetir li navendê bêtî mêvan kirin.

**AN**

- 3 - **Wexta ku pêwîst be ku nasnameya te an neteweyîya te bê rastandin an destnîşan kirin ku tu ne xwedîyê nasnameyekî an nasnameyekî ger bî, an te belgeyên xelet an sexte nîşan da be;**

**BI BÎR XE** di vê rewşê de tuyê ji bo demeke ku pêwîste qayil bibî bimînî di navendê bêtî mêvan kirin, ji bo demeke, çî be jî ji 20 rojan ne zêdetir be.

**Li gorî Qanûna Îtalyêyê, bêray ji navenda mazûvanê çûndin ne beramberê dev ji serîlêdanîya mafê penaberî berdane, lê komîsyona herêmî li ser agahîyên di dest de biryara serîlêdanîya parastina navnetewî dide.**

Wexta ku dilê te he ye ku tu herî, ji bo her tiştên ku niyet dikî bikî, û ji bo agahîya zêdetir her tim ji karmenda qanûnî ya navendê bipirse.

**JI NAVENDÊ ÇÛNDIN:** *Qanûn destûrê dide ku tu dikarî di nava rojê de ji navendê herî; wekî din, tu ji bo di wextên cûda de herî dikarî ji bo destûreke demînî serîlêdanî bi Parêzgarê bidî. Di rewşên giran ê şexsî, ya tendurustî, an yê pirsgerêkên malbatî, an ji ber tiştên li ser serîlêdanîya parastina navnetewî, tu dikarî destûreke ji bo demeke dirêjtir bistî.*

Ku gumanên te he bin, û ji bo agahîya zêdetir, rêzikên navendê bixwîne û bi karmend re bipêyive.

### **BI GELEMPERÎ:**

- Di rewşên ku di 1, 2, û 3yan de ne, ser karmendê polîs, ya serîlêdanîya te ya parastina navnetewî distîne, şandina te ya navendeya ji bo parastina navnetewî ger rêkûpêk dike, destûrnameyekî wisakî dide, ku tê de dibêje ku tu keseke parastina navnetewî ger î. Bi bîr xe ku ev ne destûra mayînê ye.
- Di dawîya dema mêvan kirinê de, destûreke demînî dê bi te bê dayîn, ku ji bo sê mehan derbazdar be, ku dikare heta biryara li ser serîlêdanîyê bê dirêj kirin, lê ji bo xebat derbaz nabe.
- Di dawîya dema mêvan kirinê de, wexta te destûra mayînê ji bo parastina navnetewî stand, divê tu navendê biterikînî û dikarî li herêma Îtalyêyê bigerî. Di vê rewşê de, her tim agahdarî kirina navenda polîs di heqê lebatên xwe bi bîr xe, wan agahdar bike ku tuyê li kuderê bijî. Ev ji bo tu ragihandinan bistî û gazî kirina ber Komîsyonê ji binge-hîn e. Ji bo standina agahdarî, wexta navendê biterikînî, li ser zêdetir mazûvanîyê bi karmenden re bikeve pêwendîyê.
- Ku li ser rewşa te biryareke nehatibe dayîn, piştî 6 mehên dawîya serîlêdanîya parastina navnetewî, mafê te he ye ku tu destûreke mayînê ji bo 6 mehan bistî, û ku tu bikaribî heta di rewşa te de biryareke bê dayîn bi serûber bixebitî.
- Ku tu biryarê bidî ku serîlêdanîya xwe berî daniştina xwe ya şexsî li ber Komîsyonê paşve bikşî, dê paşve standina te bigîje Komîsyona herêmî.

**BI BÎR XE** ku di dema bendemana biryarê de, li gorî qanûna Ewropa, tu nikarî Îtalyêyê biterikînî.

Ku tu herî welatekî Ewropa, tuyê rûniştgehê bi bêqanûnî bikî riskê.

Ku tu herî welatekî din ya Ewropa û mafê penaberîyê bigerî, ji ber ku biryara serîlêdanîya te ya li ser parastina navnetewî berpirsyarîya dewletê ye dibe ku te paşvê bişînin Îtalyêyê, (Rêznameya Dablîn II).



## MAFÊN TE YÊ LI NAVENDA MAFÊ PENABERÎ GERAN

Li gorî Qanûna Îtalyêyê:

- **Mafê te ya** alîkarîya bijîjkî û alîkarîya pêşîn ya bijîjkî **he ye**
- **Mafê te ya** cihê ji bo mêt û jinan bi cîh bûn û bi xizmên xwe re bi cîh bûn **he ye**
- **Mafê te ya** ji alî yê jêr ve ziyaret hatin kirin **he ye**:
  - Niwênerên UNHCR,
  - Parêzeran,
  - Rayedarên dagerîya penaberî,
  - Xizmên te an hevvelatên Îtalyê, yê serîlêdanî kiri bin û raya Parêzgar standî bin.

Wekî din:

- Ku tuyê bi karmendê ji cinsiyeta xwe re dilfirehtir seh bikî, tu dikarî bixwazî bi personeleke ji cinsiyeta xwe re bipêyivî an ji alî wê ve beyî ziyaret kirin. Wekî din, bi haweye ku tu ji karmenden re dîyar bikî ku amade bûna personeleke ji cinsiyeta xwe di hevdîtina li ber Komîsyonê de çêtir dibînî;
- **Tu dikarî** ji karmenden re tercîhên xwe yê xwarinê û hewceyîyên bitaybetî dîyar bikî, mînakî tiştên bi ol ve girêdayî.

### KU TU XWE DI REWŞEKE BITAYBETÎ DE BIBÎNÎ

Mînakî,

- ku tu ducanî bî,
- ku pirsgirêkên te yê fîzîkî he bin,
- emrê te pêş de be,
- di rewşa nexweşinê de,
- ku êşkişandinên te yê fîzîkî an psîkolojîk he bin ku tu xweranagirî,
- ku tu bûbî qurbana îşkence an tevgera xerab,
- ku êşkişandinên te ya êş dana cinsî he bin,

Tu dikarî agahdarî bidî karmendên navendê ji buna ku alîkarîya berbihev bistînî. Ji gotina ceribandînên herî yê dijwar an êşdar newêrîn ne ke. Agahîyên hatibin dayîn gelekî nepenî ne û bê destûra te nikarin bêne dîyar kirin.

### KU TU LI ÎTALYÊ EZEBEKE BÊKES BÎ:

- agahî bide karmendên navendê ku tu di binî 18 sal î, ji ber ku, ji alî qanûn de, wekî ezebeke tu nikarî li navendê bimînî, û mafê te he ye ku tu li cîheke li gorî emrê xwe bi hêsanî bêyî mazûvan kirin;
- Ji bo parastina te, parêzgerêkê dê bê nîşan dan; ew, keseke ku di dema ku tu li Îtalyêyê bî dê alî te bike (mînakî, di prosedûra serîlêdanîya penaberî de di belgeyên pêwîst de alîkarîya te bike, di wexta hevdîtina şexsî de alî te bike). Parêzgerêkê, di nav tiştên din

de, peywira xwe ya rastandina serlêdana te ya penaberî he ye;

- Pêngavdan ji bo ger û dîtina xizmên te bimefer e. Bi bîr xe ku ji bo ewlehîya te û xizmên te, tu kes dê agahîya cîhê xizmên te ji rayedarên welatê te re an ji kesên dinê re nebêje;
- mafê te he ye ku tu herî dibistanê;
- ji bo rastandina emrê te, û tenê bi destûra te, dibe ku tu bikevî sehetîyeke bitaybetî (X-ray ya zend), an sehetîyên din di nav navendê de an li nexweşxaneyeye herî nêztir. Di her yekî ji van sehetîyan de di tesbît kirina emrê te ya bivebirî marjekî xeletî he ye. Ku emrê ku derket emrê te ya rastî nîşan nede, vîya bi karmenden re gengeş bike. Red kirina te ya çûndina sehetîya bijîjkî di qebûl bûna daxweznameya te de, an di dest xistina biryar de astengîyeke qanûnî nayine holê.

Ji bo her pirsgirêkeke din, an zêdetir agahdarî, bi karmend re bipêyiv e.

### WEK PARASTIN GEREKE NAVNETEWÎ MAFÊN TE

- Bi dest xistina destûra mayîne, piştî bi qeyd bûna Karguzarîya Tendurustî ya Netewî mafê te ya alîkarîya tendurustî he ye.
- Ku em werin tevgerên xebat, ku biryara li ser mafê penaberî ji alî Komîsyona rayedar di nav şeş mehên berpêşkirina daxweznameyê neyê pejirandin û derengman ne ji ber te be, destûra mayînê ji bo demeke şeş mehan nu dibe û heta encama prosedûra nas kirina statûyê destûrê dide tevgera xebatê. Destûra mayînê, tevî vê, nikare bê guhartina destûra mayînê ji bo sedemên bi cîh bûna kar.
- Wekî din, tu nikarî daxweza anîn ber heva xizman bikî.

### BIRYARÊN KU KOMÎSYONA HERÊMÎ DIKARE BISTÎNE (GIHANEK III)

Komîsyon, di biryarên nivisandî de:

1. **dikare statûya penaberî nas bike;**
2. **dikare nas kirina statûya penaberî red bike û parastina kêlî qebûl bike,** ku bide ber çav ku di vegeerîna te ya Welatê xwe ya xwemalî de rîskeke bandûr ya xetereya giran he ye;
3. **dikare nas kirina statûya penaberî red bike,** lê bide ber çav ku sedemên giran ya xwezayîya mirovatî he ne û dikare ji Beşa Polîs daxwez bike ku destûra mayînê **ji bo sedemên mirovatî** bide te;
4. **dikare nas kirina statûya penaberî red bike û daxwezê qebûl neke.**
5. **dikare ji bê bingehîn bûna vekirî daxweznameyê qebûl neke,** wexta bide ber çav ku tu pêwistî ji bo nas kirina parastina navnetewî bi eşkereyî tune ne, an wexta te daxweznameyeke tenê bi şewra bi derengî xistin an asteng bûna girteyên kiriyara der kirin an neqebûl kirin berpêş kiri be. Di rewşê de, serlêdana te ya bi derfet li hem-ber biryara Komîsyonê, dê bandûra girteyên bervêdan nede sekinandin. Her wiha,

wexta ku sedemên giran û bi bingeh he bin tu dikarî ji Dadgehê sekinandina demînî daxwez bikî, û dê Dadgeh di pênc rojên pêş de biryar bide.

## KU STATÛYA TE YA PENABERÎ WERE NAS KIRIN

Komîsyon dest bi prosedûrên ku destûr dide te ku tu ji Beşa Polîs ji bo mafê penaberî destûra mayînê bistîni dike.

Destûra mayînê ji bo mafê penaberî ji bo demeke 5 salan e û di her bidawîbûnê de dikare bê nu kirin.

### MAFÊN PENABER:

- Derfeta xebitîn;
- Mafê ji nu ve berhev anîna malbat
- Mafê alîkarîya civakî
- Mafê standina belgeyên ger
  - Serîlêdana ji bo belgeyên ger divê bi navenda polîs bê dayînê, bi berpêşkirina van belgeyan:
    - Forma serîlêdan ji bo belgeyên ger
    - 2 wêneyên di formata pasaportê de
    - 1 pûla damxê
    - Pûla kargerî ji bo bikaranîna bi pasaportê
    - Jibergirtîya destûra mayîn ya derbazdar
- Mafê hevotina gişkî;
- Mafê gera serbest di herêma Ewropayê Yekbûyî de (derî Denîmark û Brîtanyê)
- Mezin) bê vîze, ji bo demeke ji sê mehan ne zêdetir;
- Mafê serîlêdana hevvelatîya Îtalyêye piştî rûniştina 5 salan li Îtalyê;
- Mafê zewacê (bi raya UNHCR hatîye dayîn);
- Mafê parmend bûna terxana xaniyên civakî;
- Mafê standina lîsansa ajotinê.

Ji bo agahîya zêdetir û alîkarî, bi komelên bi parastina penaberan û mafê penaberî geran pêwend li wara jîyana xwe re bikeve têkilîyê.

## KU TE STATÛYA PARASTINA KÊLÎ STANDI BE

Tuyê di heqê biryara Komîsyonê de bêyî agahdar kirin û destûra xwe ya mayînê ji bo parastina kêlî li navenda polîs bistînî.

Destûra mayînê ji bo parastina kêlî ji bo demeke 3 salan e û di her bidawîbûnê de dibe bê nu kirin, piştî Komîsyona herêmî rewşa te ji nu ve binirxîne, carina bê daniştinê.

Destûra mayînê ji bo parastina kêlî, wekî din, dikare biguhure destûra mayînê ji bo sedemên xebat. Ev, tenê di rewşa ku tu xwedîyê nasnameyekî bî – pasaport an belgeyên gerê – (ji bo van rêyan **berî ku destûra mayînê ya derbazdar bidawî bibe** ji komelên ku li ser parastina mafên penaberan dixebitin bipirse).

## MAFÊN YÊN KU DESTÛRA MAYÎNÊ JI BO PARASTINA KÊLÎ STANDI BIN:

- Derfeta xebitîn (ji bo demeke ku ji dema destûra mayînê ne dirêjtir be);
- Mafê alîkarîya bijîjkî;
- Mafê ji nu ve berhev anîna malbatê;
- Mafê alîkarîya civakî û tendurustî;
- Weşana belgeyê ger ji bo xerîban, di rewşa ku pasaporta te tune be;
- Mafê parmend bûna terxana xaniyên civakî.

Ji bo agahîya zêdetir û alîkarî, bi komelên bi parastina penaberan û mafê penaberî geran pêwend li wara jîyana xwe re bikeve têkilîyê.

## KU TU YEKE KU XWEDÎYÊ DESTÛREKÎ MAYÎNÊ JO BO SEDEMÊN MIROVATÎ BÎ

Tuyê di heqê biryara Komîsyonê de bêyî agahdar kirin û destûra xwe ya mayînê ji bo sedemên mirovatî li navenda polîs bistînî.

Destûra mayînê ji bo sedemên mirovatî ji bo demeke 1 sal e û ku pasaporta te he be, dikare biguhure destûra mayînê ji bo sedemên xebat.

## MAFÊN YÊN XWEDÎYÊ DESTÛRA MAYÎNÊ JI BO SEDEMÊN MIROVATÎ:

- Tu dikarî di herêma Îtalyayê de bixebitî;
  - Tu dikarî alîkarîya bijîjkî bistînî;
  - Tu dikarî serlêdanî ji bo belgeya gerê ji bo xerîban bikî, di rewşa ku pasaporta te tune be.
- Ji bo agahîya zêdetir û alîkarî, bi komelên bi parastina penaberan û mafê penaberî geran pêwend li wara jîyana xwe re bikeve têkilîyê.

## SERÎLÊDANÎYA DADGEHA TEMYÎZÊ (GIHANEK IV)

**Piştî berwara ragihandina biryara Komîsyona Herêmî di nav 30 rojan de tu dikarî Dadgehê temyîz bikî.**

Ku tu di navenda ji bo mafê penaberî geran ya Hikûmatê de bi cîh bûbî (Cara), an di *Centro Identificazione ed Espulsione* –Navenda Destnîşankirina Nasname û Derandin de bî, mafê te he ye ku piştî berwara ragihandina biryarê di nav 15 rojan (û ne 30 rojan) de daxweznameyeke temyîzê bidî Dadgehê.

**Berpêşkirina temyîzê biryara Komîsyonê bi demînî dide sekinandin, wexta ku:**

- a) te di dema berpêşkirina daxwezê de destûra mayînê standî be;
- b) tu ji ber pêwîst bûna destnîşankirina nasnameya te û netewîya te di navenda mazûvanî ya hikûmatê (CARA) de hatibî bi cîh kirin;

Ev tê maneya ku mafê te ya qanûnî bi destûra mayînê di herêma Îtalyêyê de mayîn ji bo mafê penaberî xwestin bi sê mehên hêvîya biryara Dadgehê he ye.

### BALA XWE BIDE

**Serîlêdanîya temyîzê di rewşên jêr de bandûra prosedûrên bervêdanî nade sekinandin:**

- girteyên Komîsyonê ku agahdar dike ku daxweza te ya parastina navnetewî ne birêk e;
- girteyên Komîsyonê ku parastina te ya kêlî nas dike;
- girteyên Komîsyonê ku piştî derketina te ya bê sebeb ji navenda hikûmatê (CARA) hatibe kirin;
- ku biryareke ji bo red kirina daxweza te ya bêbingeha vekirî hatibe dayîn;
- ku te berpêşkirina temyîzê piştî ku ji ber gurêzînê an azmûn kirina gurêzîna sehetîya sînor an hema di dawîya dan sekinandin an ji ber ku tu ji bo mayîna bêdestûr hatibî sekinandin di navendeke hikûmatê de (CARA) hatibî bi cîh kirin kiri be;
- tu di CIE ke de hatibî derdest kirin.

Ev te maneya ku di rewşên listeyê de, derî ku parastina kêlî ya te hatibe nas kirin, mafê te tune tu di herêma Îtalyêyê de bimînî û tu dikarî beyî verêkirina Welatê xwe ya xwe-malî; her wiha, ku sedemên giran an bi bingeh he bin tu dikarî ji Dadgehê sekinandina prosedûran bixwazî.

Qanûn destûr dide ku tu divê alîkarîya parêzereke biger î. Ku derfeta pere dayîna te ya parêzer tune be, tu dikarî daxweznameyeke ji bo alîkarîya qanûnî bêdawe bidî (bi kefaleta ji ser Hikûmatê).

Ji bo agahîya zêdetir, bi komelên ji bo parastina penaberan re an bi beşên qanûnî ji bo koçberan yê civakî li wara ku tu tê de dijî re têkilî bike.

**BALA XWE BIDE:**

**Ku tu dişewirî ku biryara Dadgeh bêdadwer e,** tu dikarî daxweznameyêke bidî Dadgeha Temyîzê û wexta sedemên te yê giran an bi bingeh he bin, û ji bo mayîna di herêma Îtalyê de destûrê bixwazî.

**Tu dikarî li hember daraza Dadgeha Temyîzê di Dadgeha Bilind de temyîz bikî.**

**BALA XWE BIDE:** berî temyîza Dadmendî, ku tu dişewirî ku regezên ku te berpêşkir tê nehatine nirxandin, tu dikarî ji wê Komîsyonê ji nu ve dadrêsî bixwazî ku dest bi prosedûran bikin. Daxwez dema temyîzê berbest nake.

Ji bo agahîya zêdetir li ser temyîzê, bi komelên ji bo parastina penaberan re an bi beşên qanûnî ji bo koçberan yê civakî li wara ku tu tê de dijî re an bi parêzera xwe re têkilî bike.

## DAWÎ HATIN Û BETAL BÛNA STATÛYA PARASTINA NAVNETEWÎ

### 1) STATÛYA PENABERÎ

Statûya penaberî ku te standibe dikare dawî bê, wexta ku:

- a) tu dîsa bi dilê xwe bixwazî ji parastina Welatê xwe ya xwemalî kelk bistînî (mînakî, ku tu vegeŕîya bî, an ku tu vegeŕîya bî rayedarên dîplomatîkî yên Welatê xwe bi daxwez û bidest kirina pasaporteke, û hwd.);
- b) hevweelatîya welatê xwe wenda bû be, te paşîyê bi dilê xwe paşve girti be;
- c) te hevweelatîya Îtalyêyê an welatekî din standi be û parastina Welatê ku te jê hevweelatî standî ye li xweşa te di çe;
- d) te bi dilê xwe li Welatê xwe ya xwemalî xwe bi cîh kiri be;
- e) hoyên destnîşankirina nas kirina statûya te ya penaberî guhurî ne û tu ji bo kelk giratina ji parastina welatê xwe bi aramî dikarî vegeŕî;
- f) tu keseke bêwelatî, û hoyan destnîşan kirin ku tu vegeŕî Welatê ku tu hîmî runîştinê bûyî, ji ber ku hoyên nas kirina statûya te ya penaberî guhurî ne.

Ku rawêjên di deqên e) û f) bibin, guhêrînên di hoyan de divê ne di xwezayîyeke demînî be û bi vê awayê tîrsa te yê bi bingeha zordestîyê bi temamî rabû be.

Wekî din, divê sedemên din yên giran ê mirovatî ku vegeŕîna te ya Welatê xwe ya xwemalî berbest bike tune bin.

Dawî hatina statûya penaberî dê ji alî Komîsyona Netewî ji bo Mafê Penaberîyê ve bê ragihandin, bi ser nixandineke ferdî li ser rewşa te ya şexsî.

Komîsyona Netewî dê destpêka prosedûrên dawî hatin û sedemên wanê bingeŕî nivisandî bi te bide zanîn, ku derfetê bide te ku ragihandinên û tişteke din ji bo nixandîne ku tu dişewirî dê bikêr be nivisandî amade bikî, û dê paşîyê te ji bo di hevdfîneke şexsî de rave bikî dawet bike.

Statûya te ya penaberî dikare paşve bê standin, wexta ku, piştî nas kirina wê, bê pêdandin ku li ser rastîyên û/an hoyên ku bi xeletî hatibin berpêş kirin, an rastîyên û/an hoyên din bi dil hatibin xemsaŕî kirin, an li ser belgeyên ku paşîyê hatibe nîşandan ku sexte ne hatibe nas kirin.

Statû, wekî din, dikare paşve bê standin, wexta ku, piştî nas kirina wê, hatîye rastandin ku sedem he ne ku statû divê bê red kirin, û bi taybetî jî:

- a) ji bo li derve hiştin sedem he ne ku ji alî Konvensiyona Cenevre hatine amade kirin (sûcekî li dijî mirovatî, li dijî aştî an sûcekî şerê kirin, an pêdandina ku ji xwe parastina an alîkarîya hebûneke û dewleteke Neteweyên Yekgirtû cûda ji U.N.H.C.R. li xweşa te diçe.);
- b) sedemên bi bingeŕ he ne ku were şewirîn ku tu ji bo ewlehîya Netewa Îtalyêyê xetereyeke pêk tînî;
- c) hoyan rastandinê ku tu ji bo ewlehîya sazûmanê û gelê xetereyeke pêk tînî, ji qanûna

peyketina cezayê ji Deq. 407, bend 2, regez a) bi dadrêsiya wekat ji bo binpêkirinan amade bû ye sûcdar hatin dîtin.

Paşve standina statûya penaberî dê ji alî Komîsyona Netewî ji bo Mafê Penaberîyê ve bê ragihandin, bi ser nixandineke ferdî li ser rewşa te ya şexsî.

Komîsyona Netewî dê destpêka prosedûra paşve standin û sedemên wanê bingehî nivisandî bi te bide zanîn, ku derfetê bide te ku ragihandinên û tişteke din ji bo nixandinê ku tu dişewirî dê bikêr be nivisandî amade bikî, û dê paşîyê te ji bo di hevdişîneke şexsî de rave bikî dawet bike.

## **2) STATÛYA PARASTINA KÊLÎ**

Statûya parastina kêlî ku bi te hatîye dayîn, wexta ku hoyan nîşan din ku nas kirin êdî tune ye an guhurîn e ku êdî parastin ne hewce ye, dibe bê dawî hatinê. Guhêrîna di hoyan de divê wisa watedar û di xwezayîyeke ne demînî de be ku bikaribe bê şewirîn ku tu êdî di vegeerîna welatê xwe de di dûçar bûna rîska *'xetera giran'* de nîn î, û divê gere sedemên giran yên din ya xwezayîya mirovatî de ji bo berbest bûna vê vegeerînê tune bin.

Dawî hatina statûya parastina kêlî dê ji alî Komîsyona Netewî ji bo Mafê Penaberîyê ve bê ragihandin, bi ser nixandineke ferdî li ser rewşa te ya şexsî û bi ya tirs *'xetera giran'* ku hatibû nas kirin.

Komîsyona Netewî dê destpêka prosedûrên dawî hatin û sedemên wanê bingehî nivisandî bi te bide zanîn, ku derfetê bide te ku ragihandinên û tişteke din ji bo nixandinê ku tu dişewirî dê bikêr be nivisandî amade bikî, û dê paşîyê te ji bo di hevdişîneke şexsî de rave bikî dawet bike.

Parastina kêlî dikare paşve bê standin, wexta ku, piştî nas kirina wê, bê pêdandin ku li ser rastîyên û/an hoyên ku bi xeletî hatibin berpêş kirin, an rastîyên û/an hoyên din bi dil hatibin xemsarî kirin, an li ser belgeyên ku paşîyê hatibe nîşandan ku sexte ne, hatibe nas kirin.

Statû, wekî din, dikare paşve bê standin, wexta ku, piştî nas kirina wê, hatîye rastandin ku sedem he ne ku statû divê bê red kirin, û bi taybetî jî:

ji bo li derve hiştin sedem he ne ku ji alî Konvensiyona Cenevre hatine amade kirin (sûcekî li dijî mirovatî, li dijî aştî an sûcekî şerê kirin, an pêdandina ku ji xwe parastina an alîkarîya hebûneke û dewleteke Neteweyên Yekgirtû cûda ji U.N.H.C.R. li xweşa te diçe.);

ku bê pêdandin ku te di herêma Netewa Îtalyêyê de an li derve sûcekî giran kiri be, an te engizandi be. Di giranîya sûc nixandin de cezayê ku tê berçav kirin ku ji alî qanûna ceza ya Îtalyêyê ve amade bûye, bi hindikî ji çar salan ne kêmtir an ji deh salan ne zêdetir e;

hoyan dirastînin ku tu ji bo ewlehîya sazûmanê û gel xetereyeke pêk tînin.

Betal bûna statûya parastina kêlî jî ji alî Komîsyona Netewî ji bo Mafê Penaberîyê ve bê ragihandin, bi ser nixandineke ferdî li ser rewşa te ya şexsî.



Komîsyona Netewî dê destpêka prosedûra betal bûnê û sedemên wanê bingehî nivisandî bi te bide zanîn, ku derfetê bide te ku ragihandinên û tişteke din ji bo nirxandinê ku tu dişewirî dê bikêr be nivisandî amade bikî, û dê paşîyê te ji bo di hevdişîneke şexsî de rave bikî dawet bike.

## BI DILÊ XWE VEGERÎNA WELATÊ XWE YA XWEMALÎ

Vegeirîna Welatê xwe ya xwemalî bi ewlehî û bi giramî mafê te ye.

Ku tu parastin gera navnetewî bî, **ku tu hatibî red kirin lê hê 30 roj ji ser ragihandina red kirinê derbaz nebû be**, ku statûya te ya penaberî hatibe nas kirin, ku statûya te ya parastina kêlî hatibe nas kirin an ku destûra te ya mayînê ji bo sedemên mirovatî he bin tu dikarî biryara bi dilê xwe vegeirîna Welatê xwe ya xwemalî bidî.

Programa bi dilê xwe vegeirîn bi alîkarî pêk tîne ku: karguzarîya şîret dan, rojane kirina agahîya li ser welatê xwemalî, alîkarîya di bi destxistina belgeyên ger ku ji alî rayedarên konsolosîyê ve tê amade kirin, rêkûpêk kirina rêbarî, û lêçûnên bi qasî cîhê çûyînê ya dawîn, û amade kirina lêçûnên tiştên pêş û tûnî bûn.

Bi bîr xe ku tu di prosedûra derandin de bî nîkarî bikevî programa bi dilê xwe lêvegeirîn.

Mafê te ye ku tu agahî û alîkarîya li ser derfeta bi dilê xwe lêvegeirîn bistîni, û tu dikarî bi ya jêr bikevî têkilîyê:

karmendên navendê.

## Ferhengok

**WEZÎRÎYA KARÊN HUNDIR:** Ev Kargerîya Hikûmatê ya Navendî ye ku ji karên koçberî û penaberî bi seretayî berpîrsîyar e.

**PARÊZGER:** Ev di herêma parezgeh de damezrakeke belav kirina Kargerîya Wezîrîya Karên Hundir e û Mezringeha Herêmî ya Hikûmatê ye.

**BEŞA POLÎS:** Ev damezrekeke Kargerîye ku tevgerên Polîs di her parezgehê de bi rê ve dibe û saz dike. Di her Beşa Polîs de, damezrekeke karên xerîba he ye ku ji pêvajoya bûrokratik ji bo koçberan û yên mafê penaberî geran berpîrsîyar e (mînakî dikare daxweznameya ji bo penaberî, nivîsan bistîne û destûra mayîne û belgeyên ger nu bike)

**KOMÎSYONA NETEWÎ JI BO MAFÊ PENABERÎYÊ:** Peywira xwe ya bi rê ve birin û hevajotina Komîsyonên Herêmî, hevotin û rojane kirina endamên komîsyona wekî bike û serjimera daneya berhev kirin he ye. Hêza xwe ya biryar dana betal kirin û dawî dana statûyên hatibin dayîn he ye.

**KOMÎSYONÊN HERÊMÎ JI BO NAS KIRINA PARASTINA NAVNETEWÎ:** Peywira xwe ya nixandina daxweza ji bo nas statûyên parastina navnetewî he ye. Herî pîrtir ji deh heba pêkhatî ye, ew ev in:

- GORIZIA: dadrêsîya li ser daxweznameyên li herêmên Friuli-Venezia Giulia, Veneto, Trentino Alto Adige hatibin berpêş kirin;
- MILAN: dadrêsîya li ser daxweznameyên li herêma Lombardy hatibin berpêş kirin;
- ROME: dadrêsîya li ser daxweznameyên li herêmên Lazio, Abruzzo, Sardegna, Toscana, Marche, Umbria hatibinn berpêş kirin;
- FOGGIA: dadrêsîya li ser daxweznameyên li herêmên Foggia and Barletta-Andria-Trani hatiibin berpêş kirin;
- SIRACUSA: dadrêsîya li ser daxweznameyên li herêmên Siracusa, Ragusa, Caltanissetta, Catania hatibin berpêş kirin;
- CROTONE: dadrêsîya li ser daxweznameyên li herêmên Calabria and Basilicata hatibin berpêş kirin;
- TRAPANI: dadrêsîya li ser daxweznameyên li herêmên Agrigento, Trapani, Palermo, Messina, Enna hatibin berpêş kirin;
- BARI: dadrêsîya li ser daxweznameyên li herêmên Bari, Brindisi, Lecce and Taranto hatibin berpêş kirin;
- CASERTA: dadrêsîya li ser daxweznameyên li herêmên Campania and Molise hatibin berpêş kirin;
- TURIN: dadrêsîya li ser daxweznameyên li herêmên Valle d'Aosta, Piemonte, Liguria, Emilia Romagna hatibin berpêş kirin.

**NAVENDA MAZÛVANÎ JI BO PENABERÎ GERAN (CARA):** Ev hesanîyekî ji bo mêvan kirina xerîbên parastina navnetewî digêrîn di dema prosedûra daxweza parastina navnetewî de ye. Sedemên ku mazûvanî pêk hatîye:

Daxwezname dayîyeke di rewşên jêr de di navenda mazûvanî ji bo penaberî geran (CARA) de tê bi cîh kirin:

- a) wexta ku rastandina an destnîşankirina netewîya an nasnameya wî an wê pêwîst be, wexta ku belgeyên ger an nasnameya wî an wê tune be, an wexta gihîştina herêma Netewî, ew an wê belgeyên sexte an rixandî berpêş kiri be;
- b) wexta daxweznameyê piştî hatin sekinandin di sehetîya sînor gurêzîn de an hewl dana gurêzîn ji sehetîya sînor berpêş kiri be, an hema piştî wê da be;
- c) wexta daxweznameyê piştî di hoya mayîna bêray hatin dîtin berpêş kiri be.

Di rewşa deq a) de, daxwezname dayîyeke nikare di navendê ji bîst rojan zêdetir bê bi cîh kirin. Di rewşên dinê de daxwezname dayîyeke di navendê de bi qasî komîsyona herêmî sehetîyê li daxweznameyê bike û, di her rewşê de, ji bo demekî ji çil û pênc rojan zêdetir nîn be.

**KOMELÊN JI BO PARASTINA PENABERAN:** Komel ji parastina penaberan an mafê penaberî geran ji alî qanûnî û kargerî de berpîrsîyar in. Ji bo tekilî bi van komelan re, li rûpela navnîşanên bi feyde binihêrin an ku tu li navendekî bî ji kerema xwe re bi karmend re têkilî bike.

**SÎSTEMA PARASTINÊ JI BO MAFÊ PENABERÎ GERAN AN PENABERAN (SPRAR):** SPRAR sîstemeke ji bo mazûvanî û întegrasyonê ye, ji alî aborî de ji alî Wezîrîya Karên Hundir û hebûnên Herêmî ku penaberî geran û penaberan pêşniyar dikin ve tê balpiştî danê, bi sînoren bi cîh kirinên bimefer, piştgirîya stargeh û alîkarîya destpêka prosedûra întegrasyon li herêmîya netewî.

**KARMENDÊN NAVENDÊ:** Ev kesên pispor in ku di navendên mazûvanîyê (CARA) de ji alî kargerî/sazûmanî de ji parastina kargûzarîyên bi parastina navnetewî gera berpîrsîyar e û pîrsgirêkên bijîjkî, psîkolojîk, û qanûnî yên vanê ku parastina navnetewî dixwazin çareser dikin.

**NAVBERKARÊN ZIMANÎ Û ÇANDÎ:** Kesên ku di navendê de alîkarîya ragihandina parastina navnetewî gera bi personelên navend û/an bi endamên komîsyona Herêmî dikin in, heta cûdatîyên çandî û tevgerî jî werdigerîn in.

**DESTÛRNAMEYA MAYÎNÊ:** Ev belgeyeke ku rayê dide te ku tu li herêma Îtalyêyê bi qanûnî bimîn î.

**BELGEYA GERÊ:** Ev belgeyeke ku rayê dide te ku tu wekî penaber hatibî nas kirin li derveyê Îtalyê biger î.

**DESTÛRNAMEYA GERÊ:** Ev belgeyeke ku rayê dide te ku te destûrnameya mayînê ji bo parastina kêlî û ji bo parastina mirovatî standi be li derveyê Îtalyê biger î.

## Qanûnên Referans

- **Navnetewî:**

- Konvensiyona Cenevre ya 1951 li ser nas kirina statûya penaberî

- ya Ewropayê Yekbûyî:

- Rêza Hejmar. 343/2003 ku pîvanên û xebitandina ji bo têr analîz kirina Welateke Endam li ser daxweznameyeke ji bo mafê penaberîyê ku ji alî hevvelateke welateke sehemîn di yek Welatên Endam de hatibe berpêş kirin diafirîn e.

- **Netewî**

- Biryarnameya Qanûnî Çileyê Pêşîn 30, 1989, Hejmar. 416 (Rêzên biteqez li ser bûyera penabera polîtîk, ketin û mayîna hevvelatên derî komel û mirovên bêwelat ku ji xwe li Îtalyê ne), hatîye guhêrandin, bi rast kirinan, ji Qanûna Sibat 28, 1990, Hejmar. 39, ji Qanûna Hejmar. 189/2002 guhartî;

- Biryarnameya Serokkomar, Îlon 16, 2004, Hejmar. 303, Birêz kirina li ser prosedûra nas kirina statûya penaberî;

- Biryarnameya Qanûnî Gûlan 30, 2005, Hejmar. 140, Fermana qanûnî kirin 2003/9/CE ku rêzên herî yê kêr li ser standina vanê ji Welatên Endam daxweza mafê penaberî dikin;

- Biryarnameya Qanûnî ya Tîrmeh 25, 1998, Hejmar. 286, Nivîsara Tenê li ser penaberî.

- Biryarnameya Qanûnî Çileyê Paşîn 28, 2008, Hejmar. 25 û Biryarnameya Qanûnî Çiriya Pêşîn 3, 2008, Hejmar. 159 Fermana qanûnî kirin 2005\85\CE ya koneyê ya Çileyê Pêşîn 1, li ser rêzên herî yê kêr ji bo prosedûrên kiryar li Welatên Endam ji bo armancên nas kirinê û red kirina statûya penaberîyê.

- Biryarnameya Qanûnî Çiriya Paşîn 19, 2007, Hejmar. 251 Fermana qanûnî kirin 2004\83\CE ya Koneyê ya Nîsan 29, 2004 li ser rêzên herî yê kêr li ser bi bar kirina hevvelatên welatên sehemîn an mirovên bêwelat bi statûya penaberî an kesahî an na hewceyê parastina navnetewî ne, bi hindikî bi qasî rêzên bi naveroka parastinê nas kirin.

## Pêwendîyên bikêr

### **WEZÎRÎYA KARÊN HUNDIR: [www.interno.it](http://www.interno.it)**

Ev sîteya Wezîrîya Karên Hundir e ku, beşa penaberî ya tê de, ji li ser babetên di heqê daxweza û nas kirina parastina navnetewî de nûçeyan dan te û referansan rojane kirin berpîrsîyar e.

### **POLÎSA DEWLETÊ: [www.poliziadistato.it](http://www.poliziadistato.it)**

Ev websîteya Polîsa Dewletêye ku ji agahdar kirina te ya li ser hebûna navendên û nivîsgehên Polîs, liqan û karguzarîyên hevvelatî yê li heremê berpîrsîyar e.

### **NAVENDA KARGUZARÎYÊ: [www.serviziocentrale.it](http://www.serviziocentrale.it)**

Ev websîteyeke ku tu dikarî tê de agahîyên bikêr li ser mazûvanîya netewî û sîstema întegrasyonê (SPRAR) bibînî, ji alî aborî de ji alî Wezîrîya Karên Hundir û Hebûnê Herêmî vet ê balpiştî kirin.

### **Navnetewî**

#### **UNHCR – Neteweyên Yekgirtû Komîserîya Bilind ya Penaberan ACNUR – Alto Commissariato delle Nazioni Unite per i Rifugiati**

Navnîşan: via Alberto Caroncini, 19 – 00197 Rome

Telefon: 06 802121

Faks: 06 80212324

E-poste: [itaro@unhcr.org](mailto:itaro@unhcr.org)

#### **OIM – Organizzazione internazionale per Migrazioni**

#### **IOM – Sazûmana Navnetewî ji bo Koçberî**

Navnîşan: via Nomentana, 62 – 00161 Rome

Telefon: 06 44231428

Faks: 06 4402533

E-poste: [MRFRome@iom.int](mailto:MRFRome@iom.int)

### **netewî**

#### **CIR (Consiglio Italiano per i Rifugiati)**

Navnîşan: via of the Velabro 5/A – 00186 Rome

Telefon: 06 69200114

Faks: 06 69200116

E-poste: cir@cir-onlus.org

**ARCI Nuova Associazione**

**Hejmara parastin telefona bêmişe: 800 905 570**

Ku tu daxwezîya mafê penaberî bixwazî, ku te mafê penaberî daxwez kiri be, ku tu penaber î an ku destûra mayîne ji bo sedemên mirovatî bi te hatibe dayîn tu dikarî li hejmara telefona bêmişe ji bo agahdarîyê an alîkarîyê biger î.

Navnîşan: via dei Monti di Pietralata, 16 - 00157 Rome

Faks : 06 41609234

E-poste: itri@arci.it; nahum@arci.it

**CARITAS**

Navnîşan: via delle Zoccolette, 19 - 00183 Rome

Telefon: 06 6861554 – 06 6875228

Faks: 06 6833295

E-poste: area.immigrati@caritasroma.it

**ICS - Ufficio rifugiati di Trieste**

Navnîşan: via Roma, 28 34170 - TRIESTE

Telefon: 040 3476377

Faks: 040 3487592

E-poste: icstrieste@yahoo.it

**ASGI - Associazione Studi Giuridici on Immigrazione**

Navnîşan: via Gerdill, 7 - 10100 Turin

Faks: 011. 4369158

E-poste: segreteria@asgi.it

an

Navnîşan: via Aquileia, 22 - 33100 Udine

Faks: 0432.507115

E-poste: info@asgi.it